

Bi Helbestvan û rojnamevan Elîxanê Memê re

(1948 - 2016)

Roja 12.12.2016 jî wek piranîya rojên van salên dawî xemgîn bû, min nikanî bawerbikira dema nameşîna kekê Eskerê Boyîk bi bûneya nemana hevnasê min î ji sala 1976 de helbestvan û rojnamevan Elîxanê Memê xwand.

Cara dawî min 4.11.2016 vê re bi têtêfon dengkir, navnîşana xwe da min û di 5ê miha çûyî de nameyek jê re şand û li benda bersivê bûm. Û bersiv ...

Dawîya bihar 1976 çawa xwandevanekî fakultêta rojnamevanîyê li zanîngeha Lomonosov, li Moskovayê min şeş hefteyan praktîka li têtêvîzyon û radyoyê Êrêvanê – kurdên me li wir wî bajarî bi Rewanê dinavînin – kir. Ew hefteyên bextewarîyê bûn, hefteyên hevnasîya şagirtekî rojavayî biçûk bi mezinên me kurdan re, ewên dîroka meye çandî bi şakar berhemên xweyî edebî, zimanî, dîrokî û civakî xemilandine, em hemî kurdên Kurdistanê burcdarên wan in.

Her wê demê jî helbestvanîyê em ji hev nêzîk kirin, Elîxan wê demê di rêdeksyona kovara zaroyan „Pîoynêr Kenc“ de dixebitî. Min serdana wî dikir û bi hev re mijûlî wergera helbestine min dibûn bo zimanê ermenî.

Rojeke germe rewanî, em ji qijavîyê dikelîyan, bi min re got ciline germ bi xwe re bîne, emê bi şev li zozana çîyayê Elegezê bimînin, li wir sar e. - Erê me vodka xwe jî bi xwe re bir – Bi pesînê (pişt nîvro û ber êvarê) re em gihîştin bin konê birayên Elîxan, du jin li wir bûn, min silav da wana, ew bédeng man, ez li ber xwe ketim û ji xwe re got, ev lal in. Paşê min bi xwe nikanî ji dostê xwe pirsî, ev jinina kî ne, çima dengnakin? Wî bersivand, ew hîn bûk in, bi xizm û mêran re napeyivin ta dîyarî wernegirin, ev edeta li navê kurdên me yên êzdî heye.

Ber êvarê birayên Elîxan bi kerîyên xwe ve hatin, me xweşbêşî li hev kir, min ji Elîxan re got, zava dipeyivin, ne „lal“ in. Li serê çîya, li deştê û hema li çolê mera çî bixwe bi mera çêjdar e, lê bi şev goştê biraştî dînin ber mera û bi gotina romannivîsê mezin Erebb Şemo „qelîyê“ bînîn – ez bawerdikim ew yek ji ciwantirîn bêje ye li ba nivîsevanê me E. Şemo, her carê ez rastî wê di romanên wî de dihatim, dilbijîya xwarinê serî hildida – Me şîva xwe xwar û ji Elîxan pirsikir, te çawa goşt bi xwe re ji Rewanê anî, min qe bi te re nedît? Got bavê min gotî, divê hûn pezekî ji mêvanê me re serjêkin. Min got ez ne mêvan im, ez hatime nav merîyên xwe, ez xwe ji malê dijmêrim.

Dewata helbestvan

Di bin vê navnîşanê de min ji zû de xwest çêrokêkê binivîsim, nizanim ew berpabû ya na, lê li vir mijara (sujêt) wê raberdikim. Elîxan odeyek li Rewanê kirêkiribû, ez êvarekê çûm cem, min hestkir, ku bitirs derî vekir, ez pirsîm, bo tu weha xefetbar î, got min hezkirîya xwe revandî, ne dêbavê min û ne yên wê razî ne, ew ermenî ye. Min got eger ez rastî bûyereke weha kêfxweş hatime, ka em şahîyê bikin. Ez ji nû ve vegehmî nav bajêr, li gulfiroşekê geryam, destek anî û pêşkêşî bûk û zêve kir û me şahî kir.

Her carekê ez diçûm Rewanê min `ese Elîxan jî didît. Paşê dinya li nav hev ket, em li welatan belavbûn, ta îlona 2015 li Sankt-Petersbûrgê zimanzanekî ermenî jî hatibû konfiransa 8 ya îranînasîyê, min jê pirsikir ku Elîxan hîn Rewanê ye, got erê.

Dostekî elman îsal çû Rewanê min jê xwest ku Elîxan bibîne, ew bi dilxweşî vegehmî, pitûkên Elîxan, du dîwan, ên kurdî bona dibistanan amadekiribûn û yên nû li ser zana û xwedîyê romana belgehî pirhêja „Hewarî“ Hecîyê Cindî anîn.

Têlêfona Elîxan jî da min. Ji destpêka sala 1983 û ta îlona 2016 me dengê hev ne bihîstibû. Me pîlan danî, ku bihara 2017 ez herim Rewanê û bi hev re li ser pirojena bipeyivin, ewna dengê wî rind dihat, min hestnedikir, ku ew nexwaş bê.

De rêya te vekirîbe li cîhana din, dostê min Elîxan! Min çend helbestên te ji herdu berevokên te diho xwandin, ew ji kûranîya dil û hestanîyê derketine, kêfxweş bûm, ku te bi kurdî nivisîne. ***Ewên berheman li şûna xwe dihêlin, timmayîn in.***

Bonn, 15.12.2016

Husên Hebeş